

HOVANIS TÛMANYAN

GÎKOR

Neşîreta Hukumata Şêwra Êrmenîstanê

---

Rewan

1932 Salê

Prolêterîyetê hemû dinyayê, yekin

Lpkc.7S

H. TÛMANAYAN

DÎYARÎYA

\*KRNDAL\*

OFFÊRT PAR

GÎKOR

Guhastin ji zimanê êrmenîyê kirin Emînê Evdal. Hecîyê Cindî

NEŞRA DÎWANÊ

1932 Salê. REWANÊ

Nivîsîna bi tîpa Latînî:

Edoyê Simko

1.10.2011

## Du Xeber

Me, Gîkor guhast ser wê nêtê, wekî ji emirê zarane. Wextêda zara ew kitêb xwendîye bi dil û eşq kêfa wan zef pêra hatye.

Hovhanêss Tûmanyen nivîsarcîkî kifşe nava xevatçiyê Zakavkasêda. Ewî gele miqale nivîsîne ji emirê xevatçiyê Zakavkasê û ji emirê zara.

Ji wan miqala yek jî, “Gîkor”e. Gîkor wî çaxî hatye nivîsarê, çîçax Zakavkasêda diha gumruh dibû kapîtalîzm, pêra jî gund wêran dibûn. Xevatçiyê gunda û zarê mîna Gîkor dihatin bajara, boy xevatê, boy paletiyê. Xwelî dest gundiyê xevatçîda tunebû, xwelî ji destê wana distandin.

Tûmanyen hema ji wê dewranê jî nivîsye, “Gîkor”.

Nivîsiye derheqa wê zelûlyê têda, yak wî çaxî bûye û zarongê nola Gîkor mezin bûne.

Lema jî me layiq dît, wekî eva kitêba zû bê neşirkirinê, bikeve destê zarê kurmancê zevatçî. Ku zaro bizanbin derheqa hal-wextê zarê xevatçiyê Zakavkasê dihêna berêda.

Nastî. Me cî-cî xeber nivîsîne bi herfê **h** û cî-cî bi herfa **y**. mesele-çûbû, cûvû û yê mayin. Cîya jî cumle awqa nêtlî nehatine nivîsarê.

Ji vê yekê heval gere bibaxşînin, çimik têrmînê zimanê kurmancî awqa jî vê gavê nayêne xevatê, tunenin.

Hovhanêss Tûmanyen

1869-1923

Mala Hambûyê gundîda şer bû. Hambo dixwest kurê xweyî 12 salî bive bajar, şixulekî jêra bivîne, bide ser sinetekî seva kurê wî pêşekêkî hîn be, lê dîya Gîkor qayîl nedibû.

-Nikarim, gedengê minî zare, hela nikare tu pêşeyî hîn be, min ne lazimî wî pêşekêye, dîya Gîkor digot û dibiland, lê Hambo gudarî nedkir.

Rojeke delal bû, lê merivê mala Hambo melûl bûn.

Hambo Gîkor dibir bajêr, gundîyê wan heta kêleka gund pêra hatin, çûne rûyê Gîkor û rêxistin.

Zanya xûşka wî digirya, Gîkol, Gîkol, kuda diçî, hêy Gîkol,, eva gilîya jî Galoyê birê Gîkor digot û dikire gaz.

Gîkor zû-zû paşda dinêrî, hela cînarê wan neçûvûn hundurê malêd xwe. Dîya Gîkor hela digirya, pê şelka xwe çevê xwe temîz dikir. Gîkor dav û pêşya bavê xwe, diçû, mîna ara dida çirtika diçû dihat, carekê jî pij/pişt xwe nihêrî ki diha gund ketîye piyê banî, naxwêne, ji wê şûnda Gîkor paşda dima, pêkol dikir.

-Ha were, Gîkor can, ha were, hindik ma, Hambo digot û diçû, xurca wî jî ser milê wî bû, xurcka xwe davû ser milê xwe, xurcîkêda destê tutûn, hine penêr, çend nan hebûn, nêzîkî êvarê bû, Gîkor û Hambo ser gelek çîya, banya û rîya derbaz bûvûn. Gîkor carekê jî berê xwe gundda kir, nihêrî gund wê nav mij û dûmanêda dixwêne, gelekî ji gund dûr ketine.

-Ha-ha bavo mala me wa te, ha Gîkor destê xwe dirêjî berbi gund kir, ewki gund qet nexwên bû, çûn dîsa. Roja ewlin gundekî qesidîn, Hamo çû mala nasê xwe.

Xişe-xişa samovara qîçik bû. Qîzeke delal fîncane dêsta xikeşî-xikaşî wê bû, dişûşt û dadigirt, keçkê kincne sore delal xwe kirivûn.

Gîkor dilê xweda digot –Ez ki çûm bajêr xevitîm, ezê Zanya xûşka xwera kincê wa sor bistînim, bivim. Êvarê pey şîvêra, Hambo û xweyê malê qelinê xwe tijî titûn kirin û dikişandin, gilîyê wanî pêşin derheqa Gîkorda bû.

Xweyê malê peyê Hambo dida, çawa Hambo kurê xwe ji gund anî bû, dixast bive bajar, bive meriv, pêşekî hîn bive.

Pey gilîyê Gîkorra, derheqa şerda xeverdan, paşê derheqa biha arzanbûna nanda, çika nan çi bihayê bajarda. Lê Gîkorî westîya bû, xewa wî dihat, radiza.

Roja dinê, rabûn, çûn bajar, nav bajêr, Tucarekî got –kalê te ew kurik anîye bikî xulam.

-Belê ez xulam. Hambo kurik devda seva ser rîya wî hilda, çû cem tucar (tacir).

-Bîne cem min, ezê bigrim. Navê wî tucarî bazaz Artam bû. (perçefiroş)

## 2

Hambo bajarda Gîkor da ber destê bazaz Artêm.

Artêm Hamborawa got, ko Gîkor malê gerekê gêzîke, pêlava paqîş ke, xarinê bibe dikanê.

Gîkor, wê meytarîke wa bikira heta salekê.

Salekê şûnda Artêm gerekê ew bibira dikanê çawa “Şagirt”, wekî wî qeydeyî Gîkor pêşda bihata û bilyan bibya.

-Hela muqdarê pênc sala ez tu heqyatê (pere) nadim kurê te, çimkî ew qe tiştêkî nizane, ya rast wekî ez bêjim, gerekê hela tu serra bidî, wekî kurê te hîn be, bive meriv. Tu fem dikî çi dibêjim Hambo.

Hambo got –Helbet, kurê min tiştêkî nizane, wekî zanbîya, minê çira banya cem te, min jî anye seba kur hînbe, berdestê camêrê mîna te.

Wê hîn be, wê her gilya hîn be, wê kêfa te hîn be....

-Nîkolê alyê we nas dikî? Ewê vira, niha dikana wî jî heye.

Ew Nîkol li cem min hîn bûye, lê hema wexta çûyînê du kevçiyê alyê û tiştê dinê dizî.

-Na, xazêyn can, eva tişta nadize, wekî ew tiştêkî usa bike, ezê bêm milkê wî bigrim û bavêjim çemê hanî kûre.

-Erê, kurê teyî hergê helal be, bizan be, wê ji xwera bive merî....

Lê, lê, derdê min jî ewe begê min, ez qurba, wekî bive meriv, zimana hîn be, merva naske, wekî mîna min belengaz nemîne, feqîrfuqare. Ew xwe jî alîfbe nas dike, Mekteba gundê meda hîn bûye, xwe jî kurekî çev vekirîye, lê reca min te heye, ko hûn rind guh bidne wî, zare tifaleke.

Ser vê yekê Artêm Hambo guman kir, derket derva û got kulfetê xwera-wekî mîvanara nan û çayê bînin.

## 3

Hambo kurê xweva mala Artêm rûniştin.

-De, niha tu zanî Gîkor can, çika kurekî çawa wê ji te derê, gerek bikî ha... ez çi zanim... ay xwedê, Hambo kire mirrîn û qelina cigarê derxist. Lê Gîkor, çar alîyê xwe mêze dikir.

-Bavo, bexîrya van tine? (Soba van tine?)

-Na, lawo, ya van soveye, hela binhêre ha... ha.....

-Bêderê wan jî tinenin!

-Na, lawo, evana bajarlîne, xwe gundîyê mîna me nînin, bêdera bikutin.

-Lê nan ji ku tînin, duxun?

-Nan, nan bipera distînin, tînin duxun.

-Nan jî bi pera distînin, rûn jî, şîr jî, mast jî, heta avê jî.

Wa.....

-Lê, ji evî bajarîra Tiflîs dibêjin, tu hela qoçax be, tê gelek tiştê teze hînbî....

-Lê dêra vana heye?

-Lê çawa, heye ew jî mîna me êrmenîne pey îsa diçin, binhêre ha-deste xwe bi xwe bigrî, dibe qestîka pera bavên erdê, hilnedî, eger te hilda jî, bivêm bêje, xanim can eva perê çine, min erdê dît.

-Vira jî çima pirîstav heye.

-Heye, lê, bê wext neçî cîya, pere dikevin destê te pûç nekî, hezar kêmasyê me hene. Xwe jî pak xweyke şevê lihêf serte neçin, serma nekî, hey-hey kaqeza minra bişîne.

Hambo hindik-hindik şîret ewledê xwe dikir, lê Gîkor, dihênijîya.

Dive kurtolê nanê kartu bidine te, xarina ber wana dimîne gele cara jî dibe ew buxun, nedin te, tişt nabe, qeydê meytarane. Rojin, wê bîn derbaz bin. Hambro dîsa şîret dikir kurê xwe, lê Gîkor razabû... kur wan roja awqa tişt dîtibû, diha lap westîyabû û nikarbû guhdarya bavê xwe bikira. Dikanda diha çî tine bû, pirtîyê cûre-cûre dabûn ser hevdu, êmiş, top û bûkê zara, firgon avtanabîl, kaçke. Lê hema wî çaxî oda mayinda Artêm kulfeta xweba şer dikirin.

Kulfeta wî digot: "Evî xame, ji cîyê beyana hatye". Lê Artêm şa dibû, seba bê heq xulam dest anîye.

-Wê hîn be, la-lawo, dîya Artêm digot.

Nato xanim bextê xwe ne qayil bû.

Ew xebatê xwe nerazî bû, wê gavê purçuyê xwe kir bû.

## 4

Gîkor tenê rûniştibû, cîyî xarina Artêm. Ew îdî nav qulixêda bû. Ew dixevitî. Kincê xwe lap guhastibû, dabû serê xwe kumê, xazêynî... kevn, pê kiribû solkê kevn, xwe kir bû kirasekî wayî pak û rûniştibû cîyê xarinê, wa difikirya çira ji gundê xwe hat bajêr, niha ketye kêderê, niha wê çî bike, çawa rabim, rûnê m û bixebitim nav meryê nenas û xerîb.

Hema wî çaxî hate hundur Nato xanim. Xanimê tişteke got. Gîkor pak, se nekir yanê jî fem nekir.

-He -terame, cewrikê hirça.

Gîkor tev hev bû, xuyî da, xwest bipirse çika çî dibêje, yek jî dilnekir xanim bi hêrs derket derba.

Hi-ez xwelîyê serê we kim, beyanîne û tîn serê merya dibin xeta, ez gazî dikim ew jî cî nalipite, deng jî dernaxe.

-Kuta bû, çiqax xirab derbaz bû....

Niha ez çawa bikim, bavê min jî çû.

Gîkor diha her gilî kuta bûyî hesab dikir. Wê demê nişkêba dîya Artêm hate hundur ewê şîret Gîkor kir. Ewê digot: lawo, wextê xanim tê, gere tu rabî ser xwe, cava wê bidî, çima ker dibî, axir usa nabe.

Pîrêra dêdî digotin.

Dêdîyê Gîkor hîn dikir, seba çawa semevarê bavêjê, pêlava temiz ke, çotkê bigre, fera bişo.

Xên ji pîrê gişk Gîkora nepak bûn. Şagirtê dikana Artêm qerf pê dikirin jêra digotin: kîkî.

Birçî bûn ki heye çetine.

Wexta mala xwe birçî dibû, diçû ji şikefa malê nan danî, kesî nedigot, çima ji kûpa penêr derdixe, dixar û diçû çolê, dilîst, yan diçû ber berxa. Wexta birçî dibû, diçû ser kanîyê, yanê binê derextekî rûdinişt û dixar.

Niha vira curekî başqeye, çiqajî birçîbî, gerekê sebirî heta nîvro, ew jî gerekê gişka nan bixara, paşê ewî. Ew wextê têrmaş jî usa dereng derbaz dibû, heta kur jî lap hal diket.

Carekê jî Gîkor gelekî birçî bû-çevê xwe çarhilqe gerand, dixwest kurtolê nan bidîta, ko bixara, heta wedê xarinê bihata.

Berê çî didît davîte devê xwe, nanê hişk, xestu. Hinekî paşê fikirmîş bû, ko here cîyê nan xarina wan. Aqiryî hîn bû ji sîtîla goştê nîvkelî goşt bikşîne-bixwe.

Lê wekî bidîtana....

Çi tiştêkî mirdar (xirab) wê ji derketa....

Lê çî bikî....

Bihêlî- birevî....

Niha Gîkor duşirmîş bû dereqa reva da, lê çawa bireve, kuda, kî alî û ew jî tenê.

Rê nizanî, merva nas nakî... lê bav....

Awqa xebitî, xeberda şîret kir – Rone lawo, wê bivin tarî jî, eê derbazbin jî....

Hela serê wîda bûn gilîgotinê bavê, Rone, wê bibin tarî jî, wê derbaz bibin jî.

## 5

Zengil lêdixtin Gîkor banza ser xwe. Gotibûnê wexta zengil lêdixin, here binhêre, kîye, çî dixaze. Ew çû derva, lînêhêrî û dît aqak jinabe.

-Ew kîne, ê, deng da ji jor.

Jêla jorê nihêrin, xanim kenya, lê xort serê xwe bilind kir, hevraz nihêrî û pirsî

-Xanime malêye!

-Gi werane, Gîkor pirsî.

Ewana diha kenyan, lawkê aqa diha hêrs bû, got: Em divên male, yan na....

-Şuxulê we heye?

Ser vê qije-vijê xanim derkete derva.

-Tu bimirî, here dêrî veke.

Gîkor çû derî vekir, mêvan hatin hundur Nato jê kenya, çû pêşya wana.

-A. ser çevê min, ser serê min, pake we em bîr anîn.

-We eva ji ku anîye, aqa ji xanimê pirs fikir, lê xanim kaw dibû Gîkorva û li wî dikenya.

Hûn çî dikenin, hiz dikin ez bidme we xulamê xwe (qerf) û kenê waba çûne hundurê malê.

Nato Gîkor şand cîkî, ew jî mêvanara çû mal.

Pey silavara mêvana serhatya xwe û xulamê Nato kirin.

Ser hatî tamam dirêj bû.

-O, dilê min meşandîye, wekî hûn zanbin, çik min kişandîye ji destê Gîkor, xanimê digot û serê xwe dihejand.

-Divêm derxe, bira inda be, here, de hûn xeysetê Artêm zanin, divê-guneye, zaruyê gundyane, wê loqe nan bixwe wê hîn be, axir kengê, dilê min herçî hebû, ew jî meşya, çû ....

O- oo... derdê wan xulama, diha nevê-mêvana cav dan.

Mêvana û Nato xanim weke nîv sehetê gilî-gotin kirin û hema wexta wana dengê xwe birîn. –Gîkor bi xuîdanêba hundur ket.

-Xanim, min êmîş anî.

-Pak, te qene kirye, Nato, got, niha here û xwe soromoro bû, lê mêvan kenyan.

-Xanim can, xazêyîn got, êmîşê dinê bihaye, lazim nîne, bira arzan be, emê paşê yê biha bistînin.

Ser vê yekê mêvana kenê xwe zeft kirin: dezmal dane ber devê xwe, wekî nekenin. Hinekî jî seva şerma xanimê. Bona şerma xanimê bidne revandinê wa gotin: -Usane, êmîşê vê aqirîyê derketye, zef bihaye, kî, niha distîne, paşê jî gotin êmîş çî lazime, xwe em nehatine seva êmîş, hûn çî zemetê dikşînin.

Xanim sor bû û dixwest kêmasyê xwe veşêre.

-Kî zane, çî gotye, fem nekiryê wî mirdarî gemar.

- Kî derewa dike bikeve erdê.

Gîkor – ko eva xebera got: gi kenyan Nato, diha nizan bû çî bigota.

## 6

Pey verêkirina mêvana, Nato bi hêrs sivor temiz kir, hey Gîkorra jî dida xebera, bextê xwe reş dikir mêr jî pêra.

-Hela xame, ewleda min, wê hînbe, lawo dilê xwe fire ke, ax xwedê tu çima ruhê min nastîni, mirîna pîrê bû....

-Bo, ez nizanim, wexta hêrsa merya tê, hûn çî dibêjin... xame, de herin hûn xwe hîn kin. Xu ez girtîyê we nînim, bûka pîrê diha dengê xwe bilind dikir û yek û yek cava pîrê dida, o dîsa nifirî xwe û mêrê xwe dikir, heta hatina mêrê xwe. Ç

Û wexta dengê mêrê xwe bihîst-diha girya û hêsir ji çeva hatin xarê, bû reqe-reqa fera, çend heb şikêrand çend hev jî avîtin ser hev.

Ez divêm derxe- bila here, ezê şuxulê xulamê te jî bikim, eger timaya pera dikî, usa nabe, yekî pak bigir, bese, ez awqa pey xulamê te bizêrim, ewî ez peritandim, xwe dijminê min nîne?

Bazaz orta malê sekinî û dipirsî çî qewmîye...



-Diha idî wê çî biqewime, ew maye, wekî meriv cem xelqê bibe sosret, te ew jî kir, xanimê dest serhatya mêvana û êmîşa kir.

A- kire qîrîn bazaz. Ax xwedê, dibû mire-mira pîrê.

Bazaz gazî Gîkor kir, pey gazîkirina wî, Gîkor bû repe-repa wî hate hundur. Were nêzîk, Artêm gazîkirê. Gîkor tirsya ji dengê wî, ji cîyê xwe nelipitî.

Tera dibêjim, were nêzîk...

Vê carê Gîkor ji cîyê xwe lipitî lê dîsa cîyê xweda ma.

Lo kurê kûçika, ez dibêjim here gilya xanimêra bêje, tu mêvanara dibêjî, wekî êmîş bihaye.

-Min... min xanimê.....

Hela Gîkor gilîyê xwe kuta nekîrbû şemaq gihîştê, pîrîsk ji ber çevê Gîkor çûn, serê wî dîwêr ket, bazaz ser erdê jî çend pihîn giyande kur û pêra digot-êmiş bihaye, bihaye, erê?

Pîrê diricifî, xwe avîte ortê, dixwest rewirê harbûyî paşda vegeîne. Nato jî çû pêşda, zara jî dikirin qîje-qîj, paşê gava Artêm heyfa xwe istand, ew jî çû paşda.

Lê Gîkor, Gîkor, jî dikire gazî û hewar, lê hewarya wî tu kes nehat, nele-nela Gîkor bû-wey-wey, nanî can, nanî (inê can, inê), digot.

## 7

Nihêrîn, ko Gîkor nikare malda xulamtîyê bike, birne dikanê, gerekê wê derê hûr-mûr bidana bikirçîya gerek çît bifrota, dikan paqîş kira, wexta valabûya jî gerek gazî bikirçîya bikira.

Gîkor diha nan dibir dikanê. Carekê jî fera desta ser pîrêda pêşda diçû, lênihêrî ser çemê kurê lotkek-du meriv têda masî digirtin, yekî tor davîte avê, yê dinê jî miqatî lotkê bû. Gîkor digot dilê xweda, wekî vê carê wê mesîya bigrin, lê wê carê tor vala derket, wexta cara duda tor avîtinê, Gîkor got:

-Ew jî bextê minra-bextê Gîkora tor dîsa vala derket.

Torçî car dinê avîtê, ew jî bextê Zanîyêra, ew jî vala derket.

-Ew jî bextê Galora.

-Galo jî bêbexw bû.

Lê îjar jî...

Wî çaxî yekî ecem meymûnek digerland û pêra distira.

Ay-were-were meymûn,

Şivka serê te meymûn,

Mîna pîra qûz-qûz.

Mîna cahila bilîz meymûn.

Cimaet tijî ser bû bû, yê dinê jî dihatin bidîtana.

Gîkor fikir xwe orta cimaetêra kira, bidîta, çika meymûn çawa dilîze.

Hema wî çaxî nişkêba kîntok tepek serê wî xist, got: bi cehim e, here şuxulê xwe, çi kula te vira heye û hema wê deqê Gîkor bîr anî û revî berbi dikanê.

## 8

Êvarê Gîkor kîlerêda qincilî bû ser hev, hela çevê wî ji hêsra ziha nebûbû.

Sûretê wî hela ji şemaqê xazêyn dişewitîn hala teze dengê xanimê hatbû birînê. Hema wî çaxî jî nişkêba şagirtê Artêm hate hundurê malê. Ewî ki Gîkor, dît, purçîyê xwe kir û cîyê xweda sekinî:

-Ji kulûbê derengî ketî, çêzkê hirçê, yanê şuxulkî teyî ferz hebû cem kopnator.

Gîkor serê xwe bilind nekir.

-Bêje, hela bizan bim-hê....

Gîkor deng nekir.

-Na bihîzî, hêy, kêderê bûyî, wekî îro te ez ji birçîbûnê bikuştama, paşê, wa hêdî-hêdî xeber dida û pêşda diçû, hevekî sekinî, paşê tepek da serê Gîkor. Gîkor herdu destê xwe da ser serê xwe û diha qincilî ber dîwêr. Vasso dikir yekî din jî bighîne kur, li dengê xazêynê Gîkor hat. Dihat.

Hela bisekine, wê te çawa bike- Vasso digot.

Niha wê min bukuje Gîkor duşirmîş dibû û merûmî bi carekêba diricifî.

Xazêyn hat malê. Ewî Gîkor dikanêda kuta bû, tenê got: nan nedinê, seva heşê wî bê serê wî.

Ser vê yekê Gîkor hevekî hêsa bû. Lê dîsa dengê xanimê dihat –Derxe, derxe, bila here idî....

## 9

Gîkor xwe qinciland, kete bin lihêfê. Şevê xewa min tine, yê min divîne divê mala wî tine, az mal tine.... Vasso kulama xwe digot, pêra nan dixar, Gîkor jî bin qilçê lihêfêra lê dinhêrî, paşê serê xwe dikir bin lihêfêra digirya û dikewgrî.

-Hi. Çawane, halê te çîye, usane, Vasso got û pirtî nan û penêr dayê, de buxwe hela xazêyn nehatye û nedîtye.

Gîkor revand nan û penêr, serê xwe kire bin lihêf vê kere-ker dixar û duşirmîş dibû.

Fikirmîş dibû derheqa gundê xwe, wexta nan û penêr fireqet, bê tirs û şerm ji işkevê hildida diçû çolê distira. Fikirmîş dibû derheqa wî çaxî, wexta mala wanda şer bû. Derheqa anîna wî bajêr bavê digot: eze Gîkorê xwe bivim, dê digot: -Na...

-Wax dayê can, te çawa zanbû eva ecêba Gîkor, hey penêr dixar hey jî guhê xwe bel dikir, bona hatina xazêynê.

Lê sibê şebeqa sekinî bû ber derê dikanê.

## 10

Gîkor ber derê dikanê sekinî bû, gazî mişterîya dikir û peyê hûr-mûrê xwe dida. Gazîke, hêy, çi sekinîyî mîna mirya. Devê teda ho av tine.

Û wa Gîkor dîsa gazî dikir: -kerem kin vira, kerem kin vira werin vira.

Hundurda ji kena dibiecîn xazêyn mervê dora xweba.

Gîkor usa hînkirbûn, ko wexta mişterî dihatin gerekê ewî pêşa wana bigirta, bikişanda hundurê dikanê. Ewa dikir Gîkor gele cara, lema jî zef dihate kutanê, çimkî kînfoa lê dixistin gava ewî usa dikir, cara jî ji germa havînê û zef gazîkirinê diwestya û cî û cîda ber dêrî, ser parça radiza.

Wexta razanê cînarê wî, yanê jî hevalê wî birnotî danîn, didan ber pozê wî, wan çaxa Gîkor dibênijî û nişkêba banzdida ser xwe. Ser vê yekê dikancî gi dikenyan û laqirdî dikirin, lê xazêyn ji kena şûnda lê dikir qîrîn.

-Radizêyî, kero, çêjkê hirçê-gazîke hêy....

Û Gîkor dîsa dikir qîrîn, kerem kin vira, kerm kin vira.

## 11

Rojekê jê, wexta Gîkor gazî mişterîya dikir, du gundî ber dikanê dît û nişkêba xwe avîte wana.

-Kuro, min qe nasnekir, eva çi teva bû bi ecêvmayî ji gundîya yekî kire qîrîn.

-Minê jî, çeva nas bikra-paê xwe da gundîk ya rast, Gîkor zef hatye guhastinê û belengaz kirnê.

Meşyaye, kincê xwe jî guhastîye, nedhat naskirnê.

Lo kuro hela binhêre tamam bûye merî, hela kincê wî merîfeta wê: gundî mabûn ecêvmayî....

Xwelîya Hambo serê me, binhêre ewî kurê xwe anî kêderê, ha. Lawkê me wêderê xinzîra diçêrînin....

Lê Gîkor ew nedidan sekinandinê pirs-pey pirsê dida wana.

-Dîya min çawane, zarê me çawanin, bavê min çira nehat, çêleka me zaye, yanê na....

Gundê meda kî mirye.

-Gi jî pakin, silava tera dişînin, her Sûknans Qûkas mir, yek jî Pûçûranss ewa pêr, yê din jî pakin.

-Lê bavê min çima nayê.

-Bavê te dixaze, lê çawa bê, ew mervakî tenêye, cefayê malê gi, ser wî ne. -Lê tişt neşandin?

Çî wan heye, çi bişîne, tu qeydê mala we, nizanî. Îsal nan zirav bû, ancax feqîrî tivêdarekê malê dîtye, eger heye gerekê tu bişînî.

-Ne kes ji mala me nexweş neketye?

-Na, ewe, her ew çêleka we Gulê ji kuleka tewlêya Mîrzera ket û hişk bû, mirar bû.

Gulê mirar bû.....

Dîya te merûm awqa girya, wekî çevê wê lap werimîn....

Pey gotinê, gundîkî nemek derxist, da Gîkor û got:

-De bêje gotina te çîye, diha em dive te nevînin, emê herin, eger tê hûr-mûr dîya xwera bişînî, bide me, em bibin.

-Ji kêderê ezê bişînim, hela ez pera naşînim..... Hema....

-Hema çi.....

-Ez dixwazim wera bême, min bîra malê û gund kirye, yek jî....

-Wa, me jî tirê tu buyî meriv, te aqil girtye, lê gilîyê usa dibêjî, ko em lap ecêvmayî dimînin.

Me digot hela tu cîyê zarongê me jî bikî, em bişînin wana bajêrêd wa. Tu vira mîna bajarlîya dijîyî, kincê teze xwe kirye-dest û pê temiz....idî.... Ew metele, mezina gotine, wekî serê xinzîrê danîne ser xalîça temiz, lê serî ji wêderê ketye nav heryê, ew niha ya teye, bira.

Evî cûreyî gundîya Gîkor şîert dikirin û aqirîyê pişta xwe danê çûn.

Pey wanara Gîkor çû koşê xwe berê nema bavê xwe xwend. Nemêda bavê wî wa nivîsî bû.

Delalê min, Gîkor can. Em sax-silametin, em saxîsilametya te dixazin. Apê te zanî, Moso, Mîkîç, Galo, gişk tera silava dişînin.

Gîkor can, zanî, dîya te, gişk tezîne, xerc ji me dixazin, eger dikarî çend kapêka bişîne....

Teba eyanbe, ko çêlekika me Gulê jî geve bû, kesek alî me nake.

Gîkor neme xwend û fikirmîş bû, kul û derdê malê (tengasîya malê) bîra wî nedçûn.

-Dîya te û Zanî tezîne....

-Cîyê me tenge....

-Bike gazî hê... çi sekinîyî, av devê te diçe, ji hundur kirne gazî, Gîkor destpê kir, kerem kin vira, kerem kin vira. Werin vira, hûr mûr bistînin.

## 12

Zivistan hat. Tîpî û baran tevda, sar kete erdê. Te digot ew tîpî û sur mervê kesîb, êtîm digerya.

Aqirîyê ewê Gîkor jî dît û lêkir.

Arxaluxukî ziravî lê bû û dîsa ber derê dikanê disekinî dikire gazî.

Carekê jî pêlek sar hat, mîna şûrekî du paxir hat û ket nav dil û cegerê Gîkor. Gîkor ricifî, xên jî wê ew jî zef meşya bû, awqa jî besê wî bû, wekî biketa nav cîya û ket nav cî jî.

## 13

Koxê Artêm kemîna Gîkorê nexweş radibû, rûdinişt, dêdî pîrê royê du-sê cara diçû teselya Gîkor dikir û pêra jî li ber xwe xeber dida.

-Çi dixazî Gîkor lawo.

-Avê...

-Dêdîyê av didayê. Gîkor bidestê xweyî ricifavî av digirt veduxar û dîsa dixast.

-Eva dilê min rehet nake, dêdî, ez ava kanya me sar dixazim, dêdî, ezê herim mala me, dîya xwe dixazim.

Bezaz Artêm fikirmîş dibû, Gerya, mervê altê wan dît, teme kir, seba Hambo bê, halê kurê xwe bipirse.

Lê Gîkor jî bir naxweşxanîyê. Wêderê gele nexweş hebû, gi cêrge ser cîyê xwe velezya bûn. Einte-Einta nexweşa bû.

Gêkor jî cem wan dane velezandinê. Hema wêderê jî bavê Gîkor kur dît.

-Tu çi bûyî, Gîkor can bi qujînîyê ba xwe gîhand kurê xwe Hambo. Gîkor germêda diqijilî haj bavê xwe tinebû.

-Gîkor can, hatime de, ez bavê teme de, lawo....

Gîkor tişt fem nekir, ber xwe xeber dida û dikir gazî, Mîkîç, Zanî, Apî-nanî....

-Va me, Gîkor can, dîya te ez şandim, seva ez te bibim malê... tu nayê, dîya te û Zanî wê ser xanî sekinîne hîvya tene, nayêyî, çi dibêjî...

-Kerem kin vira, kerem kin vira....

Digot û dikenya ber pesna.

## 14

Du roja şûnda! Hambo diçû gundê xwe. (Gîkor miribû)

Gîkor kir bûçel. Bin milda kincê ewledê xwe dibir, seba dê ser bigirya. Cêva Gîkorva çend bişkokê nexiş, perê reng-rengî û çend derzî dît. Qey ewî seva xûşka xwe top kirbû, banya Zanîyêra....

Hambo diçû û fikirmîş dibû, Gele wext derbaz nebûbû wexta ew û Gîkor ji gund hatin, çûn bajêr.

Ew-ew kevir bû, wexta Gîkor ser rûnişt-digot. Bavo lingê min dêşin ez westya me. Ewê han, ew derexteye, cîyê Hambo-Gîkor ber rûnişt, rehet bûn, cîyê lê av vexarin.

Gişk-gişk hebûn, tenê Gîkor tine bû. Roja dinê wexta Hambo çîya û banya ra derbaz dibû, Hambo gundê xwe dît kêleka gund zanî, Mîkîç dîya Gîkor, Moso, Galongê Çûçik hîvîya Hambo û Gîkorî bûn, çika wê kengê bêne malê.

Galongê çûk ber dilê dîya xwe dikir gazî: -Gîkol Gîkol –were –were –were.

INSTITUT KURDE DE PARIS

ENTRÉE N 87

Nivîsîn bi tîpa latînî:

Edoyê Simkoyê Mikoyê Elîyê Dûmanê Kelboyê OMO Xelkê kela Makê ji  
Qezwînê

03.10.2011

11.07.1390